

BERBANG

KOVARA FEDERASYONA KOMELÊN KURDISTANÊ LI SWÊD

WELATPARÊZÊN KURDISTANÊ YEK BIN!
TÊKOŞÎNA RIZGARIYÊ HÊZ DIVÊ.



AZ GUNÊY: 'ME KURDISTANÊK

KOVARA FEDERASYONA KOMELÊN KURDISTANÊ LI SWÊD

NAVEROK

Kongra 3. ya Federasyona Komelên Kurdistanê Lî Swêd.....	3
Hevpeyvîna M. Baksi bî Yılmaz Guney re.....	8
Bo Minalan ! (Helbest).....	11
Rojbaş Roza ! (Helbest).....	12
Kurtenivîsarek li ser dîroka-zimanê kurdî yê nivîsandî.....	14
Têkiliya Zaravayan(Zazaki)....	16
Çi Şixulê me hebû dî tarixa merivan de.....	18
Helbest.....	20
Mendalê Mamoste.....	21
Xaçerêz.....	22
Şeva reş, siya bedena mîn.....	23

○

Berpîrsiyar
A. RIZA ALAN

Pergala Rûpelan
A. M. GILLY

Raxistina Nivîsaran
SEYRAN û GULBAHAR

○

BERBANG

Kurdisk tidskrift, utges av Kurdiska Riksförbundet—Ansvarig utgivare och Redaktör: A. Riza Alan—Layout: A. M. Gilly—Sättning: Seyran och Gulbahar.

ADRESS

Kurdiska Riksförbundet,
Tunnelgatan. 14, 3 tr.
111 37 Stockholm/SWEDEN
TEL : 08 / 11 23 42

Prenumeration: Medlemmar
50.- kr/år. Övriga 100.-kr/år.
Postgiro: 64 38 80-8

Xwendevanên Héja,

Berbanga ku di destên we de ye, di dû kongra Federasyonê ya 3'an re, di sala 1983' an de hejmara yekemîn e. Lew re, me di vê hejmarê de cîyekî fire da bîyar û raporên kongrê.

Em di vê hejmarê de, bi lêkolîna Malmusanîj ya derbareyî têkiliyaya dangan di zaravayên zîmanê kurdî de, cara yekemîn di nav rûpelên Berbangê de ci dîdî zaravayê Zazakî. Wek ku me di hejmarên bûrî de jî nivîsandibû; divê Berbang ci bide hemû zaravayên kurdî. Bê guman, nenivîsandîna bî zaravayê Soranî, jî bo Berbangê kêmasîyeke mezî e. Lê muxabîr, pîranîya brayên me yê Soran, hin li tipên Latîni rind venebûne. Loma rîya hêsantîrîn dîdî ber xwe : Divê hûn Soranî bî tipên Erebi binivîsin, an na, em tu tişteki tê nagihîjî.

Em nikarîm li vi quncîki gotûbêjeki (munaqêşe) drêj vekî. Lê belê, divê hevalên Soran bî bir binî, ku gava ew bî tipên Erebi binivîsin, jî me Kurmancan tu kes dê nikarîbê bixwîne û fêrî Soranî jî nabe. Lê, eger brayên me yê Soran xwe piçekî bêşînin, ew ê bîkarîbî bî tipên Latîni bîxwînin û roj bî roj bêtîr li xwendîna wê jî vebî.

Berbang rexne û pêşneyarên we dipê..

Federasyona me jî cîyê xwe yê berê bar kirîye. Navnişan û telefona nu li jêr nivîsandî ne.

Le Gel Sîlav û Rêz
Lî Gel Sîlav û Gramên me
BERBANG

BERBANG

Kovara Kurdî, Xwedî : Federasyona Komelên Kurdistanê li Swêd. Buha : 5 Kron, Abonalekê: 50 Kron, 30 DM.

NAVNIŞAN

Berbang, Tunnelgatan 14,3 tr.
111 37 Stockholm/ Sweden.
Tel : 08 / 11 23 42
Postgiro : 64 38 80-8

KONGRA 3. YA FEDERASYONA KOMELÊN KURDISTANÊ LI SWÊD

BIRYARÊN GIŞTÎ YÊN KONGRA SÊYEMÎN

FEDERASYONA ME DIBÎNE Û EŞKERE DI-
KE, KU HER ÇI QAS HÊZÊN IMPERYALI Û
KEWNEPERESTÊN ROJHELATA NAVÎN WE-
LATÊ ME, KURDISTAN, PARÇE KIRINE Û
GELEK SERHILDANÊN GELE ME BO AZADÎ
Û RIZGARIYÊ BI XWIN Û ZORDESTÎ VEMI-
RANDINE JÎ, TEVGERA GELE ME NESEKINI-
YE. EW, ROJ BI ROJ BI HÊZTIR Û BILINTIR
DIBE BER BI ARMANCA XWE DIÇE

Iro dî du (2) parçeyên
Kurdistanê da - dî parçeyên
bin destê rejimên
Îraq û Îranê - şerê parti-
zani bî xurtî ciyê xwe gir-
tiye û gelê me bo şikan-
dina nirê bîndestiyê û bo
destxistina heq û azadiyên
neteweyî bî mêrani
ber xwe dîde. Dî herdu
parçeyan da jî hêzên we-
latparêz bo temamiya
wan welatan demokratî û
bo Kurdistanê otonomî
dixwazin.

Dî Îraqê da pişti lîhev-
hatina 1975, ya dî navbera
rejimên Îraq û Îranê
serkirdayetiya kewnepe-
rest bî belavbûna şoreşê
razi bû û bî vi avayî şoreş
belav bû. Lê pîr neborî
ku hêzên welatparêz lî
Kurdistanê Îraqê jî nuh ve
bî hêz bûn û dest bî şerê
partizani kirin. Seddam
Husên dî welat da dikta-
torîyeke xwinrêj pêk ani,

hemû heq û azadiyên de-
mokratî dan aliyekî û bî
Îranê ra şer derxist. Re-
jîma Bexdayê dî van salên
dawi da pêwendiyên xwe
bî imperyalîya cihani û bî
rejimên kewneperest yê
Rojhelata Navîn ra xurt
kir.

Dî Îranê da, pişti ru-
xandina rejîma Şahê zor-
dest lî Kurdistanê jî tev-
gera welatparêz bilind bû.
Lê meleyên ku hukûm bî
dest xistin şoreşê jî rîya
pêşveçûnê veçetandin,
heq û azadiyên demokratî
cardin qedexê kirin û bir
û baweriyên xwe yê
olperest û kewneperest dan
pêşîya gel. Pergala mele-
yan jî daxwazên gelê
Kurd ra razi ne bû û pas-
dar û leşkerên xwe ajot
ser Kurdistanê. Gelê
Kurd şûn da ne kîşîya,
serî lî ber meleyên kew-
neperest danani. Jî bo vê

yekê, ku ev çend sal in lî
Kurdistanê Îranê dî nav-
bera hêzên welatparêz û
pasdar û leşkerên
Xumeynî da şer berde-
wan e.

Eşkere ye, ku Seddam
Husên û Xumeynî, herdu
jî dî welat da rê lî pêşîya
hêzên demokratî girtine,
zordestî dîkin, xwin dir-
jinin. Şerê navbera wan
bî kerî gelên Îraq û Îranê
naye. Ew xwina xebatka-
rên herdu welatan dirji-
nîna bona armancên xwe
yen kewneperest û şo-
wen. Ew dewlemendiyên
herdu welatan dî şerêkî
vala da telef dîkin. Her
wîsa jî herdu alî dî
Kurdistanê da, diji gelê
Kurd şer dîkin û heq û
azadiyên gelê Kurd ra ra-
zi nabin.

Federasyona me diji şe-
rê Îraq û Îranê ye. Mafê
hemû gelên Îraq û Îranê
ev e ; ku ew rejimên dik-
tatorî û kewneperest - a
Seddam û a Xumeynî bîn
hîlweşandin û lî ciyê wan
rejimên pêşverû, yê de-
mokratî sazbin. Da ku ge-
lên herdu welatan jî vi şe-
rê xirab xilas bin û bo
demokratîyê û pêşveçûnê
re jî wan ra vebe. Jî bo vê
yekê jî divê him lî Îraqê,

hemû hê-
zên pêşverû û demokratî
dest bîdin hev, refê xwe
bîşîdînin, bo ruxandina
van rejimên zordest û
kewneperest û bo sazki-
rîna pergaleke demokratî
kar bikin. Divê dî herdu
welatan da jî eniyên (cep-
he) fireh sazbin û ew piş-
girtîya hevdu bikin. Fe-
derasyona me vê yekê
dixwaze û piştigirtîya hê-
zên demokratî û pêşverû
yên herdu welatan dike.

Federasyona me, lî
herdu parçeyên
Kurdistanê yê dî bin
destê rejimên Îraq û Îranê
de piştigirtîya tevgera we-
latparêz dike. Federas-
yona me, her wîsa jî, zor
pêvist dibîne ku bona
serketîna hêzên welatpa-
rêz, divê hemû hêz û tev-
gîrdanên welatparêz dî
nav xwe da yekîtiyeke
xurt pêk binin, eniyeke
fireh saz bikin.

Lî Tirkîyê imperyalî û
kewneperest jî bo ku tev-
gera gelên Kurd û Tirk
vemurîn û sazûmana
xwe ya pûç û sist bîşîdi-
nîna, dî 12 Îlonê, 1980'da
bî destê generalan perga-
leke faşîst saz kirin. Dî vê

demê da bî sedan merivên welatparêz û pêşverû tîn kuştin, bî sedhezaran kes hatin girtin û li ser wan zulm û tada nediti hatin kirin. Xasîma li Kurdistanê, li gund û bajarên Kurdan, xirabiyên mezîna hatin kirin. Hukumeta Tirk pîraniya leşkerên xwe li Kurdistanê bî cih kir.

Lê imparyalist û xulamên wan ên faşist ne gihîştin armancên xwe. Ji rewşa abori ra çare ne hate ditin ; birçiti, betali û buhayî roj bî roj bêtur bû. Gelên Kurd û Tirk bereki va ji vê birçiti û betaliyê, bereki va, ji zulm û zordestiya pergala faşist bêzar bûn. Iro ev, li hember zordestiya leşker û polis nikarin dengê xwe bî xurti derxînin, lê zîkê wan diji pergale tije ye.

Pergala faşist û piştgirên wan ên imperyalist, ditin ku tenê bî usulên zordesti kar bî rê va naçin, dest pê kirin ku derbasî pergaleke sîvil bînin. Li gor xwe "zagona bîngehin, çekirin û bo sala pêş me hazîriya hîlbijartîna parlamane dîkin. Lê bî rasti ev ne derbazbûna pergaleke sîvil e an jî demokratîyê ye. "Zagona bîngehin" hemû heq û azadiyên bîngehin betal dîke. Derheqa gelê Kurd da bendên nuh hatine danin, ku zmanê Kurdi bî şikleki resmî ji qedexe dîke. Armanca wan ev e ; ku sazumanê niv sîvil - niv leşkerî saz bînin û pergala faşist bimeşînin.

Le ev planên nuh ji jî derdê wan ra çare nabîne. Teverga gelê Kurd û Tirk, li Tirkîyê û Kurdistanê bin destê wê, di firsendekê nuh da dê cardin xwe

bî xurti nişan de û pîr ehtimal e ku icar dawîya zulm û zordestiyê bine. Federasyona me bî xurti piştgiriya teverga welatparêz dîke li Kurdistanê Tirkîyê. Bo serketina hêzên welatparêz yekitiya hêzên welatparêz di cepheke neteweyî da hewce dîbine. Her wisa ji Federasyona me piştgiriya hemû hêzên demokrat û pêşverû dîke li temamiya Tirkîyê, bo hilweşandina rejîma zordest û kewneperest û bo sazîkirina pergaleke demokrat li welat.

Federasyona me piştgiriya gelê Kurd dîke li Sûri, bo destxistina heq û azadiyên neteweyî û demokratî. Her wisa ji Federasyona me piştgiriya hemû hêzên demokrat û pêşverû dîke, diji êrişên imperyalî, sîyonî û diji kewneperestiyê, û yekitiya wan dixwaze.

Di havina çûyî da, êrişkerên Îsrail bî piştgiriya imperyaliya Emerikî leşkerên xwe kirin Lubnanê. Beyrût xera kirin û şewitandin. Armanca wan ew bû ku derbeke mezîna li hêzên rîzgarîxwazên Rojhelata Navin û Filistin bînin, teverga Filistin û hêzên pêşverû û welatparêz ên Lubnanê bîşkênin, armanc û planên xwe li Rojhelata Navin bî cih binin.

Dawîya vê êrişê, fedayiyên Filistinî jî Beyrûtê derketin Lê teverga gele Filistin wek do berdevam e. Federasyona me piştgiriya gelê Filistin dîke ku ew vegere erdê xwe û qedera xwe bî serbestî û bî destên xwe tayîn bîke.

Di van salên dawî da imperyaliya cihani ket

krîzeke kûr a nuh. Tevî wê, êrişkerî û kewneperestîya wê jî bilind dibe. Hêzên imperyalî zor dîdîna çekîrîna çekên nuh, kar û xebata bo aşîtiyê betal dîkin, têkîlî karê welatên dinê dîbin û dinyayê bî şereke atomî dîtînin.

Federasyona me aşîtiya cihanê bo hemû mirovatiyê tîşteki grîng dîbine. Divê xetera şerek cihani, ango şerek atomî bê kêmkirin û pêşî li plan û xirabiyên imperyalîstan bê girtin

Imperyalîst heyî û hatiyên welatan bo rindîya xebatkaran, bo tîştên baş û di riya baş da serf nakin û dîkin çek û jahr jî insanan ra mîrmê hazîr dîkin. Devê ew imkan û pere bo rakîrîna birçiti û betaliyê li seranserî dinyayê û di riya aborî û çandîniyê da bê xerckîrin.

Imperyalîsten Emerikî nuha destê xwe bî xurtî dirêjî Kurdistanê Tirkîyê kirin, li wê meydanên nuh bo balafirên xwe saz dîkin û çekên gran, yê atomî û leşkerên xwe li wê cih dîkin. Eşkere ye ku sibê şerêki mezîna derkeve ; Kurdistanê dîbe nişangehek mezîna û kevîr li ser kevîr wê nemîne û welatê me wê seranserî bîşewite.

Federasyona me, bo hemû mirovatiyê û dinyayê, her wisa jî bo gel û welatê me, diji plan û êrişên imperyalîstan, diji çekîrîna çekên atomî derdîkeve, kêmkirin û bî temami rakîrîna wan dixwaze.

Federasyona me dixwaze Rojhelata Navin, Behra Hindi, Ewropa Navin û Rojava, welatên Skandinavi, Efrîqa bî te-

mami jî çekên atomî bîna paqîjkirin.

Federasyona me, li Kurdistanê balafir û çekên atomî yê Emerikê naxwaze. Diji militarîzma Tirk, Iraq u Iranê kar dîke ; ewana heyiyên gelê me û yê gelên dinê dîkin çek û gule û pê êrişî ser me dîkin. Federasyona me gazi hemû Kurdên welatparêz û huşyar dîke, ku piştgiriya teverga aşîtiyê bînin û diji êriş û planên imperyalîstan derkevin.

Yek jî berên krîza imperyaliya cihani ev e, ku li welatên imperyalîst da tevergên nijadparêzî, ku piştî şerê duwemîna sîst bîbûn, cardin serê xwe bilind dîkin û dijayetiya roj bî roj xurt dibe.

Welatên imperyalî, xasîma piştî şerê duwemîna, bo avayîha welatên xwe, jî derva, jî welatên şûndamayi bî milyonan karker anîn, ew bî salan dan şuxulandin, ew şêlandin û jî pişya wan dewlemendiyên mezîna kom kirin Nuha jî ku di rabarî krîzê da di van welatan da betali çê bûye, pîr kes wek sedemê betaliyê biyaniyan nişan dîde û wisa dîbine. Sermiyandar û merivên kewneperest û nijadperest xasîma wisa nişan dîdîna ku teverga xebatkaran jî riya rast - jî dijayetiya sermiyan - veqetînin, wan bajon ser biyaniyan û yekitiya karkerên welat û biyani xera bînin.

Federasyona me bî xurtî diji tevergên nijadparêz û dijayetiya biyaniyan derdîkeve û eşkere dîke ku betali û buhayî di rabarî biyaniyan da nine, ew nexweşiya kapitalîzmê ye, tim hebû û wê hebe. Karker jî kijan mî-

leti dibin bila bîbin, birayên hev in, mafê wan yek e û xilasbûna wan bi yekitiya wan pek têrin.

XEBATÊN DAHATÛ

FEDERASYON DÊ JI BO REALÎZEKIRINA MESELÊN JÊRIN BIXEBITE

- 1- Mafê hûbjartîne bo biyaniyan, di hûbjartîna parlamentoyê da.
- 2- Lî dijî paşvestandin an kêmkirina mafên rêxistinên biyaniyan.
- 3- Hevkari bi federasyon û rêxistinên din ra û xebat bo çîh girtina di nav SIOS da (Federasyona Federasyonên Biyaniyan li Swed).
- 4- Pişgirtiya xebata li dijî nijadperestiyê li Swêd û tedbirên ciddî li hember geşbûna nijadperestiyê.
- 5- Ji bo derxistina Berbangê ji 15 rojan carek.
- 6- Xebatkar ji bo Berbangê.
- 7- Vekirina beşa zmanê kurdi di dibistana mamostan a bilind de.
- 8- Mafê radio û TV a kurdi.
- 9- Enformasyonên dewletê bîn wergerandîni zmanê kurdi.
- 10- Domandina proja zmanê zikmaki.
- 11- Damezrandina Koma Folklorê.
- 12- Damezrandina Koma Tiyatroyê.
- 13- Damezrandina Koma Muzikê.

Xebatên Sala Bûri

I

RAPORA GIŞTÎ

Hevalên Nêner!
Xuşk û Brayên delal!

Iro, Federasyona Komelên Kurdistanê li Swêd kongra xwe ya sêemîn çêdike.

2 salên dijwar ji jiyana Federasyonê derbas bûn. Ev her du sal dijwar bûn, ji ber ku avakirin û meşandina ev çend freh, bi hêsariya çênebû. Bi bawerîya me ji ev tişteke xwezayî (tebîî) bû. Cara yekem bû ku gelek komelên Kurdistanê, ku her yek ji wan li ser bir û baweriyên çîhê bûn, di hatin cem hev, ku di bin baskê da bîbin yek. Ev xebat iro bi ser ketiye û baskê ku em li bin çiviyane Federasyona Komelên Kurdistanê li Swêd e.

Eşkere ye ku ev gav, bu gaveke diroki li Swêd. Û her usa, bû moraleke bilind bo gelê me, hem li welat hem ji li dervayê welat.

Federasyonê, perçebûyîn û kaosa kevn ji ortê rakir, bû dengeke xurt û bilind bo her hêz, kesên welatperwer. Bû dengê kurdên li Swêd, bû otorîte û bû kulmeke sert li ruyê dijmin. Em bi vê yekê pir serbilind in.

Jiyan û xebatê, hebûn û pêwistiya yekitiyê, anggo Federasyonê baş eşkere kir. Baş xuya bû, ku çî daxuyan bin û çî pey-

wendi bin, bi dengeke xurt û bi neticeyeke çê pêk hatin.

Dostên me, bi ve yekitiyê kêfxweş in, û bê şik evyekitidê dostên me hê zêdetir bike. Lê dijminên me ji, ew qas bê huzûr in. Qet şika me tune, ku ji bo felîşandin û sist kirina Federasyonê ji dixebitin.

Hevalên Hêja!

Mîn, di destpêkê da Qala dijwariyên ku di avakirina Federasyonê de peyda bûn kir. Û dixwazim bi vê yekê ve ku ev dijwariya bi xebateke dîr û dirêj ji ortê rabûn. Û ya heri girîng, Federasyona me, netica daxwaza yekitiyê ye. Her hêz û kesên welatperwer, bi dil û can dixwestin ku dengê gelê me di Federasyonê Kurdistanî da bibê yek. Û ev daxwaz bû, ku federasyona me çêkir, û disa ev daxwaz e ku me aniye vê rojê. Federasyon gav avetiye, pêş de çûye û fi-reh bûye.

Federasyonê, kongra xwe ya yekem di 25'ê Gulanê, 1981'yan da bi beşdariya 6(şeş) komelan vekiribû. Ev hejmar, di kongra duwem da ji kem zede ew bû.

Iro 15 komele, û ji her çar perçên Kurdistanê, bi xwestineke xurt kongra sêemîn çêdikin. Û Federasyon, bê şik, hemû

kurdên welatperwer temsil dike.

Hevalên Hêja!

Lî welatê me Kurdistanê, şerê rîzgar bûnê, ji her demên derbasbûyî xurtir û peşdatir e. Ji ber ku wext û şertan gelek tiştan hinê gelê me kirin. Dost û dijminên me vekirirtên xuya kirin. Şerêki jirtir û hişyartir tê ajotin. Ev şer, ne tenê şerê netewî ye, her ûsa şerê xelasiya belengazên Kurdistanê ye ji. Dijmin iro, ji her rojan zêdetir ji me ditirse. Lî Kurdistanî Iran û Iraqê pêşmergeyên Qehreman, gelê me yê mîrxas, li dij napalmên dijmin radiweste.

Her roj gelek mirovên me, çî pêşmerge, çî xelkê sîvil canê xwe fedadikin. Lî Kurdistanî Turkiyê, bi taybetî piştî cûnta leşkerî lîdan û îşkencên dijmin zêde bûn û ev, tîrsa wan eşkere dike. Bi vê tîrsa xwe zordestiyeke bê-hempa li ser gelê me dajon. Îşkence, lîdan jiyana rojane ne bo gelê me. Gelek welatparêz di zindanan da liberxwe didin. Gelek welatparêz, mecbûr man ku ji welat derkevin. Hinek ji wan ji li Swêd in.

Lî Kurdistanî Sûriyê, gelê kurd bo mafên xwe yê demokratîk, li gor şert û şîrûten xwe, tîkoşin dike. Rejîma Baas, mafê gelê Kurd inkar dike û zordestiyê li welatparêzan Kurdistanê dike

Hevalên Hêja,
Xuşk û brayên delal !

Rast e, em li Kurdistanê, di nav şerê germ da ninin. Îşkence, lédan, birçimayin ji me dûr in. Lê belê hêviya me, dilê me, daxwaza me yek e. Dijmînin her tîştên me ji me girtiye, lê nikaribûye hêviya me ji me bistine. Şer, ne tenê şerê germ e. Alikari û hevgrîtin ji şer e. Nasdayina şerê gele me li Cihanê ji, şer e. Karê rewşenbiri ji şer e. Şerê

geli, bî gelek şax û guli ne.

Federasyona Komelên Kurdistanê ji, li gor şert û şirûtên xwe, di vi şeri da cih girtiye. Bûye minakeke (misal) hêja. Bûye ro-nahiyeke geş. Bûye hêviyeke baş ji bo kurdên li Swêd.

-Bila ev hêvi neşkê, xuşk û brayên delal !

-Bila federasyon bibe dengeke xurt û kulmeke sert li hember dijmin.

-Bila bîji yekiti.

-Bila bîji Kongra me ya sêmin.

II

RAPORA XEBATÊ

Komita karger, piştî kongra 2'yan, wek organa heri bilind di civina xwe ya yekem de biryar li ser kar û xebata komita karger da û wek prensip qebûl kir ku ji heftê careki bicirve. Û heta iro ji ev prensiba ani cih. Endamên komita karger di van civinan de li ser xebatên pêş da û xebatên pratik biryar didan.

- Piştî Kongra 2'yan, Federasyon ji aliyê Daira Biyaniyan ya Dewletê (SIV) û serokatiya wê, ji bo danustandînan resmi hat dawet kirin. Hemû endamên komita karger li ser vi dawetê çûn Nærköping'ê. Li wêder bi serokê SIV, Thord Palmund û bi berpirsiyarên beşên din re civin çêkirin. Di van civinan de bi tevayî li ser kar û xebata Federasyonê hate sekînan. Serokê SIV pêkhatina Federasyona Kurdan piroz kir û ji bo xebatên pêş da serfirazi

xwest.

- Civina Komita nûneran ya yekem çêbû. Di vê civinê da, ji her komelên endam 2 nûner û endamê Komita karger bejdar bûn. Bi tevayî li ser xebatên Federasyonê û li ser Newrozê hat sekînan. Biryar hat sendin ku Newroz ji aliyê Federasyonê bê piroz kirin.

- Newroz, 13'ê Adarê, 1982 li Folkets Hus - Stockholm hat piroz kirin. Li Swêd cara yekem bû ku hemû komelan û hêzên Kurdîstani hatibûn cem hev û li ser navê Federasyonê şeva Newrozê pêk hatibû. Nêziki 1000 kes, kurd, swêdi û biyaniyên wek din di şevê da bejdar bûn, û roja Newrozê ango roja li dij zordestiyê bi awaki baş hat piroz kirin.

- Roja 17 - 3 - 1982 da di bin inisiyatifa Federasyonê da, Komela Mamesteyên Kurd hat damezrandin.

- Roja 28 - 3 - 1982 di da di bin inisiyatifa Federasyonê de Komela Ciwanên Kurd ya sporê hat damezrandin.

- Alikari ji bo proja zmanê zikmaki hat xwestin ji SIV û 20.000 alikari di vi wari de ji Federasyonê ra hat. Ev proje hin xelas nebûye lê hevalek ji Komita karker bi vê projeyê mijûl dibe.

2'ê Gulanê 1982 li ser rewşa Kurdistanê Panelêk pêk hat. Di vê panelê de gelek nûner û temsilkarên parti û rêxistinên Swêdi beşdar bûn. Nêziki 200 kes di vê panelê da civiyan û li ser rewşa hemû perçeyên Kurdistanê axaftin û nîqaşe çêbû.

- 1'ê Gulanê 1982 da hemû komelên endam di bin bandrola federasyonê de civiyan û ketin meşa 1'ê Gulanê. Nêziki 400-500 Kurd hatibûn meşê.

- Civinek di navbera Komita Karger û Redaksiyona kovarê de çêbû. Ji bo çapkîrîna Berbangê biryar hat stendin. Tarix 30. 3. 1982

- Lokalek ji bo civinên Komita Karger û ji bo xebata rojnama Federasyonê hat peyde kirin. Hin ji ev lokala di destê federasyonê da ye.

- Komita Karger li ser gelek muracaatên komelên Kurd, li ser endamiya wan biryar stend. Ev komelên ku nuh bûn endamê federasyonê, vana ne. AKSA,KSSE, Komela Gelê Kurd-Komela Kurd li Nacka-Komela jinên Kurdistan-Komela demokratik ya kurdên Suri-Komela kurdên Iranê..

- Li çend belediyên Stockholmê da ji bo pedagogên malbatên Kurd muracaat çêbû. Piştî vê

muracaatê gelek civin bi berpirsiyarên Belediyê re çêbû û li Tensta Rinkeby Karek dan Kurdan.

- 15 Gulanê, meşek li hember sefaretê Tirkîyê çêbû û bûyerên girtigeha Diyarbekrê û zordestiyên cûntayê hat protesto kirin. Nêzi 500kes di vê meşê de beşdar bûn.

-Ji bo nîvîsandina in-formasyonê bi zmanê Kurdi di hîlbijartina Swêd de 8000 ji SIV hat stendin û ji bo vê xebat bû.

- Komita Karger civinek resmi bi wezira biyaniyan, Karin Andersson re çêkir. Di vê civinê de xwestina federasyonê ji bo K. Andersson hat pêşkêşkirin. Bi taybeti li ser rewşa kurdên Sûri hat axaftin û ditina Federasyonê di vi wari de hat pêşkêş kirin.

- Namek li ser navê Federasyonê ji bo pêwendiyên resmi bi radyo û televizyona Swêd re nameyek resmi nîvîsand.

- Ji bo redaksiyona Berbangê û berpirsiyarê Kovarê, Komita Karger biryarê nuh da û hevalek hîlbijart.

- Li ser navê Federasyonê civinek bi nîvîskarên Kurd re ji bo xebata Redaksiyonê hat çêkirin. Gelek nîvîskarên Kurd ku li Swêd in, li vê civinê beşdar bûn û ditinên xwe ji bo karê redaksiyonê pêşkêş kirin.

- Civinek bi endamên Komita Swêdiyanre (Kurdiska Solidaritets Komittén) çêbû. Li vê civinê, ji bo derxistin û domandina broşurên Swêdi, derheqê Kurdîstanê, wek biryarê prensib, hat stendin.

- Ji Federasyonê ra Komposerek (daktiloya elektronik) hat stendin.

- Lı ser avakırına "Federasyona nuh" bi nunerên daira Biyaniyan. (Invandrar Nämnd) Belediye û SIV re civinek resmi hat çekirin.

- Pêşneyar ji bo destûr û programa Federasyonê hat çekirin.

- Bı inisiyatifa Federasyonê, Komita Tırkyê, Bir-Kom û İstib bi hev ra 12 İlonê da meşek li hember seferata Tırkiyê çekir û salawextiya 2-ya ya cunta leşkeri hat protesto kirin. Meşê da nêzê 700 cıvıyabûn û li Swêd cara yekem bû ku bi hev ra û tenê meşek çêbû.

- Lı ser destûr û programa Federasyonê civina Komita nûneran çêbû. Hemû komelên endam ditin û pêşneyarên xwe li ser destûrê pêşkêş kirin.

- Lı ser zmanê Kurdi

civinek li belediya Huddinge çêbû. Nûnerên federasyonê û nivskar û mamostên Kurd di vê civinê de beşdar bûn.

- Civinek bi berpırsiyarê SIV û federasyonên biyaniyanre çêbû. Civina 4 û 5 ê Mijdarê de, li ser navê federasyonê hevalek beşdar bû û ditin û rewşa Federasyona Kurdan pêşkêşî wan kir.

- Komita karger û serokê SIV, Palmund, civinek li ser rewşa Kurdên Iraqê çekirin. Di vê civinê de Komita Karger ditinên federasyonê derheqê hatina gelek kesên Kurd ji K. Iraq, ji serokê SIV re pêşkêş kir.

- Muracaata projeki ji bo cıwanên Kurd li swêd hat kirin. Ji bo vê xebatê 40.000 Kron ji SIV hatiye xwestin.

- Ji SIOS (Federasyona Federasyonên Biyaniyan li Swêd) re nameke resmi ji bo endametiye hat şandin.

- Komita Karger li ser dewrgirtina mal û tiştên Komela Çande û alikariya Kurdên li Swêd, biryar girt. Lı ser navê federasyonê hevalek di komita dewrkirinê de beşdar bû.

- Bı S. Ö (serokatiya dibistanan) re du civinên resmi çêbûn.

1- Ji bo ferhengeke Kurdi, 3 heval wek kontrolvan tesbit bûn.

2- Ji bo proja zimanê kurdi.


- Lı ser mesela pedagogên malbatên Kurd nameke resmi ji belediya Botkyrkare hat şandin.

- Nameyek weha ji Uppsala ra ji hat şandin.


Lı herema Tensta

û Rinkeby'ê ji bo vekirina beşekê taybeti (ji bo zaroyên Kurd) li zarokxanê danûstendin hat kirin. Lı Karlstad sminer çêbû. Hevalek ji Komita Karger vê seminerê meşand.

- Ji bo derxistina kovarê (Berbang) muracaata resmi çêbû û ji bo sala 1982 programek ji bo derxistina 6 hejmaran çêbû. 15.000 alikari bêt stendin ji bo van 6 hejmaran. (Eger di 1982 an de her şeş (6) hejmar ji derkevin) Alet û malzemeyên ku pêwist bûn hatin kirin û heta niha 4 hejmarên kovarê derketine. Hejmara 5'an ji di çapê da ye. Redaksiyona Berbangê ji meha Gulanê bi vir de li ser kovarê dixebite. Û abonên Berbangê niha 50 ne.



MAHMÛT BAKSÎ BI YILMAZ GÜNEY RE PEYIVÎ



YILMAZ GÜNEY: «ME KURDISTANEK YEKBÛYÎ, SERXWEBÛYÎ Û DEMOKRATİK DÎVÊ»

Kurdi: Newzad Rêbin

PIŞEKAR (SENETKAR), NIVİSKAR Û DENG BÊJÊN ZAHMETKÊŞ, JI BO ŞIKANDINA RÊZİLÊN (ZINCİR) POLA Û AZADBÛNA JI WAN, BI HEZAR SALAN E KU LEJEKE BÊNA (BÊ DAWÎ) DIKIN... YÊN KU RIK Û HÊRSA KITLEYAN... TÊKOŞINA WAN A BERAMBERÎ ZILM Û MÊTINKARIYÊ XWEDÎ Û BITIR DIKIN Û WÊ JI NESLEKÊ RADIGIHÎNIN NESLE-KE DIN, EW IN. HOSTEYÊN VAN DESTANÊN GEWRE, CARINA MÎLYONÊN GEL DI ŞEX SIYETA XWE DE SENTEZ DIKIN Û MEZIN DIBIN... BI XELKÊ VE YEK DIBIN Û DIKELIN. YILMAZ GÜNEY, YEK JI VAN E... ZLAMEKÎ KITLEWÎ YE.

Yılmaz Güney, beşeke mezin ji jiyana xwe di girtgehên kolonyalîstan de buharr. Hilberiyên xwe yê herî hêja di nav van salan deafirand. Disa filmê xwe yê "Yol", ku di seyrana (Festiwal) Cannes'ê de xelata "filmê çaktirin" wer-girt ji di dema zindanê de pêk ani. Bê guman, ev xelat bûyereke zaf gring e... Ne tenha bûyereke pişeyî ye; digel wê, bûyereke siyasi ye. Di mana şikandî û azadbûna ji gerinekên ku ji ramanên çinên stendar (hakim) pêk hatine û di

mana bi hev ve kelandin û li hev nêzbûna li hêlekê gelên Kurdistan û Tirkîyê û li hêla din gelên cihanê de, bûyereke siyasi ye...

Ji bal me gîşan ve têt zanin ku -- di dû serketina mezin a YOL re -- Yılmaz Güney niha filmeki nû çekiriye. Bi gotna wi, ev film wê bibe "Filmê êşeke dili, orinek ji kezêbê û raperinekê (serihildan)"

Ez bî navê radyo û televizyona Swêd, dî demeke wulo de ku xebata wi, ya filmê dawî dajot, bûm mêvanê wi. Televizyon û radyoyê cihêki zaf fire dan intibayên mêvandariya min. Beşekî jî vê peyvê dî "Merhaba", pişka tirkî ya Radyoya Swêd, de hat weşandin. "Aftonbladet", rojnama Sosyal demokrat, a ku rojê çarsed hezar nivîşt çap dibe, û rojnama "Stockholms Tidning" bî rûpelên seranser dagirti ve nîvîsaran çap kîrin.

Ez li jêr, kurtenîvîsarek ku min rojname û weşanên radyo û televizyonê amade kirîye, pêşkêşî we xwendevanên berêz dikim.

'EZ TÊGIHAM KU EZ KURDEKÎ ASÎMÎLEKIRÎ ME'

— Yılmaz Güney, tu dikari bî kurtayî xwe bîdî naskirîna ?

Y.G. — Navê min ê rastin Yılmaz PÛTÛN e. Çil û şeş salî me. Bavê min jî gundekî Sêrekê ye û Dîmlî(Zaza) ye. Diya min jî jî Mûşê, jî eşîra Cıbran e. Kurmanc e. Ez, bî zewaca van her du mirovên ku dî çaxa seferberiyê de jî welatê xwe bar kirîna, li bajarê Adana'yê jî dayika xwe bûm.

Dî salên min ên zarotî û ciwanîyê de, dî navmala me de bî Zazakî û Kurmancî dihat şorkirîna. Lê, min şexsiyeta xwe ya netewî, bî mana siyasî û zanistî hin rind nedînasî. Bî pêşveçûna zanyariya xwe ya siyasî ve, ez li realîta xwe varqîm (ferq kirîna). Ez têgîham ku ez Kurdeki asimîlekirî me. Li xwendegeha ku em diçûnê, digotîna me hûn Tirk in. Em li gorî ideolojiya netewî û ferma (resmî) dihatîna perwerde (talîm) kirîm.

Min 1955'an de, li Adana'yê, xwendegeha navîn qedand. Ez dî salên xelasekê de, tim dî bin çavdêriya (obserasyon) polis de bûm. Jî ber hikayeke ku min nîvîsandin, propaganda kirîna Komunîzmê bî min ve danîbûn (bî dî min xîstîbûn, xîstîbûn stuyê min).

Dî 1960'î de hatim girtin. Dî dî du salan re hatim berdan. Dî vê navê de, min dî hînek filmên bî karakterên populist, (yên ku xelk wan bî filmê macera û lej - lîdan dinavîne) de leyist.

Piştî 1970'î, yanî dî dî vatnîya leşkeriyê re, pejna

(his) diriyahiya guherîneke mezîna hat min. Diriyabû guhartînekê bîkîm. Ciyê vatnîya min a leşkerî Mûş bû, jî lew re ez jî nûser ve ketim hemêza Gelê Kurd. Ez, li pêşberî vê realîte, bî lerzeke pîr kurve hejîyam.

Dî dî 1972'an re - wek têt zanin - ez tim girti mam.

— Tu li ser hev çend sal girti mayî ?

Y.G. — Tev tevî hev 12 sal razam.

"'ENDİŞE' QALA GUNDİYÊN KURD, ÊN XIZAN DIKE"

— Piştî derketîna xwe ya jî girtîgehê, te gelek filmên girîng çêkirî. Wek "Arkadaş" û "Endişe". Dîkari piçêki qala vê demê bîkî ?

Y.G. — Ez jî Selimiyê bî "bexşandîna giştî" ve derketîbûm, dî Gulana 1974'an de... Min dî serê xwe de şeş hikayan çêkirîbû. Yek jî van, bî bîngeha xwe ve li ser hoyên jîyana birjuwazî bû û qala tipekî rîziyayî ku çîna xwe guhastîbû, tipekî rewşenbîr dikir.

— Hikaye, yê te bî' tebi'î ?

Y.G. — Belê, gîş hikayên min bûn. Dî "Endişe" de jî, bî bîngeha xwe ve ez bî pêşbîra (gaye, maxsed) diyarkirîna rewşa paleyên Kurd ên xîzan, ku jî bo berevkirîna pemu barî Adana'ê dikin, bî rê ketîbûm. Listîkvanên min gîş Kurd bûn. Lê, vê dawiyê -wek têt zanin - li min komplo çêkirîna. Navê min bî kuştîna hakîmekî ve derxistin, belavkirîna. Jî ber vî sedemî 19 sal ceza dan min. Ez dî vê navêde

tenê sê meh û bist roj li derve mam.

— "YOL" çawa bî ser ket ?

Y.G. — Min senaryoya wê li girtîgehê nîvîsand. Mîjara (mewzî) senaryoyê, serbûriyên girtîyên ku bî destûra hefteyekê jî girtîgeha niv-girti diçûn malên xwe, bû. Ê min dixwest, bî pêşkêşkirîna hefteyekê jî jîyana van kesan, panorama Tirkîyê û Kurdistanê bîxêzinim. Min vî filmî de, dema em bî yêna din ve bidîna ber hev, rêyeke cuda da ber xwe. Ez, bî tevayî jî hikayên ku hatîna jîyan bî rê ketim. Jî aliyê dravî ve, ev film jî aliyê min û şirketa "Kaktus" a İsvîçreyê ve finansê bû. Hemû karên dî dî kîşandîna film re min bî xwe kir. Em bî van karan ve, bîvênevê, gelek tabîyan. Lê jî van taban tu yek jî, ne ta'beke ku em nikarîbîna jî heq derkevin bû. Gelek kes dikarîna weha bîfîkirîna : Filmekî bî vî rengî çawa dikare dî hoyên dîktatorîya faşîst a leşkerî de pêk bêt ? Nexwe qîsmî be jî atmosferê azad li Tirkîyê heye. Divê bersîva vê پرسê jî sedî sed ev be : Li Tirkîyê, bî mana qîsmî be jî, ne mîmkun e ku mirov bîkarîbe qala azadiyê bike.

"MANZARAYÊN MIROVAN JI TIRKIYÊ Û KURDISTANÊ"

— Naveroka film ?

Y.G. — Yol, wek têt zanin, qala hin girtîyên ku bî destûr jî girtîgeha niv-girti çûbûn malên xwe dîke. Dî film de sê hevalên bîngehin hene ; Mehmet Salih, Seyit Ali û Ömer. Jî van Ömer, dî li ber çav raxistîna zilma netewî ya li ser Gelê Kurd de, roleke girîng dilîze. Seyit Ali jî, dî li ber çav raxistîna damezrandîna feodali ya gundiyên Kurd, jîmên wan û bî taybetî peywendiyên wê ên nav-malî de xwediyê roleke gelek girîng e. Rola Mehmet Salih jî kêm û zêde wulo ye.

Me, dî YOL de manzarayên mirovên Tirkîyê û Kurdistanê û manzarayên civakî pêk anî. Me rastiyê diyar kirîna. Gelek kes, li hember vê yekê dîsîlîkîna (tepki rîdîdîna). Mesela,

raberkirîna Kurdistanê dî YOL de, gelek kesên şoven jî hîrsa din û har kir. Lew re şana xayîniyê jî bî min ve datînin. Jî xwe burjuwazî min tim "xayîn" îlan kirîye. Min tim wek "dîjîmnê gel" îlan kirîye. Ez bî vê yekê çet paxav nakim û ber nakevim. Eger gelê min jî min re xayîn bigota, ez ê ber bîkîtima. Belam, gelê min iro min hemêz dîke û li min xwedî derdîkeve. Jî lew re burjuwazî jî êrişî min dîke û dê bike. Ev tiştêke gelek tabî ye.

— Tiştên ku ev film derheq gelê Kurd de dibêje û raber dîke çî ne ?

Y.G. — Dî vî filmî de bî taybetî, qedexeyên li ser tekoşîna gelê Kurd, ya ku xwediyê rabîrdûyeke drêjî dîroki ye, bî awakî qîsmî be jî hatîna doku-mentî kirîna. Jî ber ku çî hebûna gelê Kurd be, çî jî karakterîna kolonîbûna welatê wi be, tim jî ber çavan hatiye veşartîna. Me, dî vê der de (dî YOL de) bî teşeyêke (şekil) herî berbiçav hebûna Kurdistanêke kolonîzebûyî li Tirkîyê, raber kir. Ê vê yekê li ber çavêna bir û raya giştî (efkari umûmî) ya cihanê raxist. Ya duwemin me zilma ku li gelê Kurd dîbe, ne jî bo wi, lê jî bo yêna ku wi nanasîna û hay jî vê zîlmê ninîna, raber kir. Yan na, tu pêşbîreke me ya wulo ku em jî gelek Kurd re bîbêjîna "mezeke tu dî bin zîlmê de yî" ne bû. Ew jî xwe dî bin zîlmê de ye. Her roj wê dîjî.

— Tu, wek pişekareki Kurd ê raguhestî (surgûn kirî) dikari bî çî awayî beşdari tîkoşîna rîzgariya netewî, ya gelê Kurd bîbî ?

Y.G. — Dî bîngeh de, çî bî nîhîrîna pişeyî be, çî jî bî siyasî be, mirov dikare rewşa gelê Kurd û realîta ku têt de dîjî li ber çavan raxe. Vatnîya li pêş me, dî bîngeha grêdanên tîkoşîna gelê Kurd bî tîkoşîna gelên din ve, xwe bî hêzkirîna, perwerde kirîna û kûr kirîna tîkoşîna ye. Belam eşkere ye ku ev, mesela pêvajoyê (process) ye. Ez bî pêşerojê bawer im.

— Tu li ser çêkirîna filmên Kurdi difikiri ?

Y.G. - Ez lı ser filmeki ku bıkaribe diroka têkoşina gelê Kurd ifade bike difikrim. Kar û barên ku ji bo amadekirina filmeki weha pêwist in, demeke dirêj dajon. Lê ez bawer im ez ê bi serkevîm. Kurmekî min heye : Beri ku ez tişteki bikim, lı serê mijul nabim.

- Beri ku derbasi pirsên din bibim, dixwazim bal bi metodeki te yê ku bi taybeti bala mirov dîkşine, yani rewşa jinan, vê îşaret bikim. Mesela, listkivaneke pirek, bêî ku tu gotin ji devê wê derkevîn rola xwe ya di film de dimeşîne. Dikari lı ser vê xususe ji me re hin tişt bibêji ?

Y.G. - Sinama, di esas de bızav (hareket) e. Mirov di tiyatroyê de, dikare pırsa xwe bi diyalogê rohnî bike. Lê di sinamayê de bızav, awır û wêne bêtr gring in. Ev ji xususiyeteke, ku teknika sinamayê bi xwe re aniye ye. Eger mirov bıkaribe di sinamayê de rûçikê (sima) insan rind bi kar bine, mirov ê bıkaribe diyaloga rûpeleki bi wêneyeki (resim) raber bike.

- Lê tipen bîndest, ên jinan?

Y.G. - Ev ji gelek tabii ye. Ji

ber ku lı Kurdistanê bi taybeti rewşa pirekan gelek vekuri ye. Jmên Kurdistanê di bin zordestiyeke du-ali de dîjin. Ev, lı hêlekê zordestiyeke feodali ye, lı hêla din ji grêdayi bêparmayina ji azadiya abori ye. Rızgariya pireka Kurd, bi ya netewa wê ve û bi taybeti ji bi ya çina wê ve grêdayi ye.

"KURDISTANEKE SERBIXWE"

-- Gava ku te bi filmê "YOL" ve, lı Cannes'ê xelata yekemin girt ; te ji weşanên dinê re got : "Ez pişekar û rejisoreki Kurd im". Sedemên ku vi tiştî bi te dan gotin çi bûn ?

Y.G. - Divê ev weha bêt diyar kirin : Divê mirov reha xwe ya netewi inkar neke, lê xwedi derkeve. Ji aliyê din ve, heke ez ne Kurd buwama ji, min ê tekoşina beramberi zulma netewi wek vatniyeke bızaniba. Mirov tenê ji vê helê ve ji lı meselê mêzeke, mirov ê bibine ku gelê Kurd iro di bin stemeke netewi a giran de ye. Bifikre carekê, netewek heye ku nikare bi zumanê xwe bixêfe, stranên xwe bistrê... Bızava wê ya piçuktrin a ji bo pêşeroja wê ya siyasi, bi ce-

zayên grantrin têt pelçiqandin. Mesela, iro lı Tirkîyê nêziki bist hezar militan - şoreşger û demokratên Kurd di grîgehyan de ne. Lê gava ku qala Tirkîyê têt kirin, bi ser vê meselê (mesela Kurd) re têt qevazdan. Divê ev mesele, bi şêleke vekuri bêt rastê. Ji ber ku bûyera 12'ê Îlona 1980'yi, tenê ji bo rawestandma têkoşina xebatkar û demokratên Tirk nehatiye, sedemeki din ê hatina wê, du-çat kirina stêma lı ser netewa Kurd e.

- Pıraniya pişekarên ku bi eslê xwe ve Kurd in - bi taybeti, yên ku di planê navnetewi de bi nav û deng in - ji bo kariyer û menfeatên xwe, rehên xwe yên netewi inkar dikin. Te weha nekir. Bo çi ?

Y.G. - Ez di vê dere de tişteki ne-normal nabim. Eslê min Kurd e û ez dibêjim eslê min Kurd e. Ji aliyê din ve, ji bo mirov stema ku lı gelê Kurd dibê têbigihije, ne pêwist e mirov kahin be, an falbaz be. Ev, rastiyeke pır vekiri ye. Û eşkere ye ku gelê Kurd ji dê wek hemû gelên din têkoşina rızgariyê bike, û rızgariya netewi bi xwe mafeki wi ye. Yani her gel, mafê xwe yê çarenûsi dê bi hêza

xwe tayin bike. Yê ku em bi rasti pê bawer in, gelê me bi xwe ye.

- Lı Kurdistanê hişyarbûneke bêdeng û agreki venemir ê lıberxwedanê pêl didim. Tu pêşeroja vê hişyarbûnê û vi agrê lıberxwedanê çawa dibini ?

Y.G. - Dema ku ez qala Kurdistanê dikim, tenê qala Kurdistanê ku di nav sinorên Tirkîyê de ye û koliniyeke wê ye, nakim. Ez koloniya Îraqê, Tirkîyê, İranê û Sûriyê yekparçe dibim. Bi ditna min a arzî (şexsi) Kurdistan, serkaniya şoreşa Rojhelata Navin e, xwediye potansiyeleke wulo ye ku fonksiyona serkanibûnê dibine. Çi ji ber stema netewi be, çi ji ber stema çini be û çi ji ber terkiba herduyan be, di pêşerojê nêz de wê bibe çiyê ku agrê şoreşa Rojhelata Navin lê geştirin vêdikeve, çaxa em lı wa'deya dîr û dirêj binihêrin, em dikarin weha bêjin : Bi rasti tu gel bi toqa hesni ya di stuyê xwe de û bi qeydên di zendik de qima xwe nayne. Bi taybeti xelkeki wek xelkê Kurd neteweke wek netewa Kurd ku miriyê xireta xwe ye (lı xireta xwe ew çend mîqate ye), vê dilitiyê tu cari qebûl nake. Mesele giş ev e ; ku mirov pêşveçûna siyasi û serwestkirina siyasi di nav geli de, heta quncikên heri dîr belav bike. Ji ber ku ideolojiya bandêr (hakim) hebûna netewa Kurd - nola (mina, wek) ku me ji demeki dikir - red dîke...


- Tu di serê xwe de Kurdistanê çawa çêdiki ? (Tu Kurdistanê çawa difikiri ?)

Y.G. - Kurdistanê ku ez di serê xwe de çêdikim (lê difikrim), Kurdistanê yekbûyî, serxwebûyî û demokratik e... Kurdistanê ku hedefa wê sosyalizm e...

- Tu bi damezrandina Kurdistanê weha bawer i ?

Y.G. - Belê, ez bawer im ku Kurdistanê weha dê mutlaqa ava bibe.

Dûmahik lı rûpelê 19'an e.



Seyid Eli



Mihemed Salih




Omer



Mewlud



Usw



BO MINALAN !

Minalekan!
Ey bê lane, jin talekan:
Şew le xew ma rêbîwarek bûm
Bo baregay " Yotan*" deçûm
Ke derwazekey qûti dam
Reş'im bini alay hebû,
Spi'm bini – alay hebû

Herçi'm bini alay hebû
Qijandiyan be ser'im da:
" Ey bê wîlat bo derewe
ey bê ala bo derewe"
Mîn'iş gût'im: Meqjênin!
Ke deçimewe, em çiroke
Bo minalan degêrimewe!

A. Peşêw .

* »Yotan« : Sıkreteri pêşûy Netewe Yekgirtuwekan.

ROJBAŞ ROZA !

Rojbaş
Beyanî be xêr
Ez û tu
Bi çivîk—firê
Sê hezar kîlometre ji hevûdu dûr
Lê, bi giyanî
Ji canê hev ji hev re nêzîktir in.

Dengê min na gihîje te, dizanim
Di vê berdestî sibê
Di xewka şîrîn
Pêjnê
Hilîne
Ku dibêjime :
Di xewnê de rojbaş
Di xeyalê de beyanî be xêr .

Bi nermî çavên xwe veke
Tevzî li ser tevziyê bi şîranî
Belav ke li canê xwe
Û bi giranî
Bi bîr bîne ku
Ev herikîna pêlên pêjnîn
Di ser bej û derya de
Bî mîlmîlîn
Ji hinavê min î sofî
Bi axîn
Derketiye .

Ev ne nonûçe ye, metirse
Ev ragihîn
Ev dazanîn e, ji dilê min ve
Dilê min
Kaniya agir
Dilê min
Kevanê evîn

Xarîta dinyayê veke li ber xwe

Li hêla bakurîn binihêre
Tê bibînî
Bejekî
Ku mîna nikulekî kêr
Serejêrî Atlantîkê biye
Serî ,
Ji derya qeşemê gewr
Û dilê wê
Jî bêriya Rojê dixewire
A . . .
ha !
Li wir e ,
Hêlîna tenyayiya dilê min .

Gul li şaxê
Kulîlk di guliyê xwe de xweştir e .
Ku ji avê derkeve
Masî
Dimire .

Rast e ,
Meriv meriv gotiye
Masî jî masî . . .
Em ,
Ne masî ne, ne gul in, ne kulîlk
— Bi çavek xwas
Gava lê bê nihêrtin —
Lê em jî
Ji hêlîna xwe ya çande—civakî
Ku dûr Kevin
Ji wan gelek
Ne têveltir in.

Ez ,
Ne şaxa hewrê
Ne şiva mêwê me
Ku bê reh hêşîn bibim ji nû ve
Ji nû ve reh berdim di axê de .

Tu wisa
Bi çavekî xwas
Bi mantiqekî rût
Li sinê min menihêre .
Heriya min ,
Di teştâ çandekî mêjûyî de
Bi hezar salan
Hatiye hevîr kirin
Û ez hatime patin
Di hêtûna
Netewe -bûyina
 gelekî
 kevintirîn

Û ez
Ji Zerduşt pîrtir
Ji sedsaleya xwe
Hêşintirîn.

Biyaniî dijwar e , Roza !
Biyaniî ,
Kabûsekî har e, di ser sînga meriv de
Û tenyayî ;
Mîna dilopekî xwas
Li Okyanûsa Mezin
Bi serê xwe :
Bê winda bûn ,
Bê fetisîn
Jiyîn ...

Ey tihna di nav pêlên xwîne de !
Meqerime
Meqerise
Raneweste weşekî
Bifûre
Bikele
Meawiqîne gera xwe.
Haya te
Jî te
Hebe.

Bo welatê xwe, jî welat dût im
Bo welatê xwe cêlî û tenya
Bo welatê xwe ,
Li van deveran tengezar im .

Ey olana heyvê
Ku niha
Leylana wê li Dîclê
Li Firatê diîse
An mîna keçperiyek dileyize
Li ser deryaça Wanê
Û ey kevirên reş î Amedê
Ku niha
Li ber tava wê dibirise :
Hun nizanin ku dilê min
Çawa bi we ve ye ,
Bi bêriya we çawa davêje
Çawa dimerise
Ji weşê carek .

Rozayê !
Xweşkokê
Şîrinê
Hişazayê
Li pêş vîna mun ronahî
Di şêna min de, serketina li xwezayê
Lê ,
Bûka yekşevîn
Ku tevî zavê ranezayê ;
Ramîse jî ber min ve
Bi çavên xwe î keskî belek
Stêrkên me
Yek bi yek
Û derkeve pêrgîna Rojê
Bi sariya sibê
Bibêjê :

— " Ey dostê me î rabirdû
Mefera pêşbîra me
Tê kengê bibişirî jî me re ?
Kengê bî me re
Derkevî serketinê ? "

Roza !
Dilmiza evîna min
Xweşî, şahî bo te
Rojbaş
Beyanî be xêr .

Rojen Barnas

KURTENIVÎSAREK LI SER DÎROKA ZIMANÊ KURDÎ YÊ NIVÎSANDÎ

Reşo Zilan

Ji hejmeta 5'an dom dike.

Di dîroka kevnare de, bavikên Kurdên îro gelek dewletên serbi-xwe û mezin ava kirine. Ji van dewletan yê herî kevnare û bi nav û deng dewleta Lolobiyayî, Gotiyan, Kutiyayî, Mediyayî û hwd in. Gelo zimanê resmi yê van dewletan û herweha çend dewletên din, ku me navên wan nenivîsîn, çi ziman bû? Hin tiştên ku ji warên van dewletên kavilbûyî bi dest ketine, nîşan didin, ku dewletên bapîrên Kurdan ji wek dewletên din yê gelên cînar zimanên biyanî bi kar anîne û pê nivîsandine. Lê heçî Medî ne, welê dixuyê, ku wan di gel zimanên gelên cînar zimanê xwe jî bi kar anîne. Lê sed heyf û mixa bin, ku bi zimanê medî jî ji billî çend peyvên pê ve tu tişt negihane me. Mediyayî jî wek "Faris û Elemiyan bi tîpên bizmarî yê Asûriyan"(13) nivîsandine û zimanên asûrî, e-lemî û farisî bi kar anîne. Ji xwe di wê demê de her tişt bi tîpên bizmarî ve dihatin nivîsandin. Lê tiştê herî helez ku mirov dibîne, ew e ku Farisan komên tîpên bizmarî yê dijwar pir hêsan kirine û bi tenê çend lib ji wan helbijartine, da ku pê zimanê xwe hêsantir binivîsin. Wan jî çend sed lib nîşanên cur-

becur yê nivîsandinê yê Asûriyan bi tenê 41 nîşanên nivîsandinê wergirtinê û ew di şûna nîşanên dîwanî de, mîna ku em îro alfabê bi kar tînin, bi kar anîne. Lê belê Asûriyan li bervajiyê ve ew bi tenê wek nîşanên nivîsandinê bi kar anîne.

Me divê em li vir li ser çend îdîayên hin nivîsevanan rabiwestin û li wan binhêrin û paşê derbazî çaxa piştî Zayîniyê bibin. Bêî vê kirê dê ev lêkolîna me ya ha derî rastiye û rastbinê be. Ji ber ku hin ji van îdîayan demeke dûr û dirêj çêbû xwe di nav rûpelên pir pirtûk û nivîsaran de wergirtine û bi vî awayî bûne sebaba belavbûna nerastiyeke. Ji van îdîayan yekemîn ya Reşîd Yasimî ye. Ew di pirtûka xwe de îdîa dike û dibêje, ku "Kurdan berî niha bi 5 hezar salan bi kurdî nivîsandine"(14). Rûşen Bedirxan jî di pirtûka xwe de ji afirandina Reşîd Yasimî kad dike û, wekî ku ew rast e, jê van rêzan wêdigire:

"Yek ji perestên da ku di vê de ji wan re 'mux' dibêjin, ji herêma Hewremanê ye. Navê wî Pîre Şalyar e û bi navê 'Merve tu Pîre Şalyar' pirtûkek li dû xwe hîştîye. Pirtûka wî ji

*Delê: Jale Bo wa talît?
Delê: Le ber biramirdin.
Gulit bo wa cuwan e?
Delê: Le ber dost û dujmin.*
(ji gotinên bav û kalan)

hin zencîreyên helbestan pêk hatîye. Nivîsavan piştî her bendek ji bendên wê, vê malika jêrin rêz dike.

*'Gotinên Pîre Şalyar bibihîze
Guh bide şretên Sîmyar'(15)*

"Dîroka vê pirtûkê li dor 5 hezar sal berî niha ye. Herweha helbestvan di benedekê pirtûka xwe de holê dibêje:

'Di daran de can hene

Riç û pelên wan wek dil û ceger in

Dar di hin demsalan de bi cilên xwe yê tamam in

Di hin demsalan de bêî cilên xwe ne

Mirîşk ji hêkê çêdibe, hêk jî ji dayîna wê ye

Rovî jî ji rovî dizê, gur jî ji gur

"Dîsan ew di benedekê din ya pirtûka xwe de weha dibêje:

'Berf dibare, şopa berfa berê ketî wînda dibe

Dema ku bend diqete, çar seriyên wê çêdibin

Mirîşka reş hêkên spî vedike

Gava çêr dişkê du devikên wê çêdibin'(16)

Gava mirov, ji kîjan aliyê ve dibê bila bibê, li van rêz û îdîayan mêze dike, nikare bi hêsanî pê bawer be, ku emrê û temenê wan bi rastî 5 hezar sal kevn bin.

Sebaba yekane ew e, ku heta bi niha hîç dîroknasek derneketîye

û bi awakî zanistî îspat nekiriye, ku ola Zerdeşt ji 5 hezar salan kevintir e. Wek me berê jî jê kad kiribû, ji dayîkbûna Zerdeşt li dor salên 660-ên berî Zayîniyê Vêca 5 hezar sal kevnûna van rêzan û herweha pirtûka Pîre Şalyar ne mimkun e ku rast be. A diduwan, peyva "Şalyar" yan jî "Şaryar" ne peyveke hinde kevn e. Ev peyv di dema Sasaniyan de û cara pêşîn li ba Farisan hatiye bi kar anîn. Heye ku ev peyv her di wê demê de ketibe nav xezîna peyvên zimanê kurdî. Bi farisî jî vê peyvê re "şehryar" dibêjin. Ev peyv bi xwe nav û nîşanek e û wek me got, bêfir di çaxa Sasaniyan de cihê xwe girtiye û mana wê ya bingehîn jî "Kesê dost û yarê bajêr" e. Lê paşê wek nav û nîşanekê û bi mana "Şah, qîral"(17) û "giregire bajêr"(18) hatiye bi kar anîn. Wek: "Şehryarê heft iqlîm"... Tevî vê jî, Peyva "şalyar" di kurmanciya jêrîn de, bi mana "wezîr, şîretkar"(19) jî tête bi kar anîn. A sîsiyan, gava em ji aliyê etîmolojîkî de li vê peyvê hûr dinhêrin, em nikarin rehên vê peyva hevedudanî bi 5 hezar sal berî niha ve girê bidin. A çaran, peyva "pîr" jî ne peyveke hindê kevn e. Mana wê ya bingehîn jî "kal, rûspî" ye. Lê paşê her dîsan wek nav û nîşanekê olî (dîni)di tore û zimanê olperestiyê de hatiye bi kar anîn. Wek di rêzên jorîn de jî

hatiye gotin, ji kesên ku xwe dispartin ola Zerdeşt û xwe gorî wê dikirin re, ne pîr lê belê mux (mox) digotin.

Bi kurtebirî, ji ber van sebeban em bi xwe hîç ne di wê qinyat û baweriyê de ne, ku Pîre Şalyar berî niha 5 hezar salan jiyabe û herweha ev rêzên jorîn nivîsandibe. Her navê wî bi xwe jî, gava em navên kevnare yên bi zimanê arî, sanskrîtî û awestayî didin ber çavên xwe, vê îdiayê jî binî ve û her yekser pûç dike. Bi a me, îdiayên holê, heye ku ji hisa xwepiçûkdîtinê pê ve ne tu tiştêkî din be.

Ji bilî van îdiayan hin îdiayên mamoste Gîw Mukriyanî jî hene. Ew di afirandina xwe ya bi navê "Ferhengî Mehabad" de ji dîroka nivîsandina zimanê kurdî kad dike û bêî ku belgeke rastîn û zanistiyê binimîne û darî çavên me bike, dixwaze me bigihîne dongî û netîceke neberbiçav û nerast. Ew, her çi tişte ku bi zimanê pehlewî (farisiya navîn) hatibe nivîsandin, wek "Karnamakî Artaxşîrî Papakan", hemûyan bi kurdî dihesibîne... Ji bilî vê jî, wek van herdû tiştên jêrîn, hin tiştan dibêje, ku me dil nîne, ku ne em li ser wan tiştine zêde bêjin û ne jî wilo bi gengazî baweriyaya xwe pê binin.

"Teng-Gelo ku bi navê Şengul hatiye nasîn, kurdekî zane û biwêjekî (edîbekî) Cizîrî, ji çiyayên li bakura Musilê ye. 700 sal berî zayîniyê pirtûkek bi zimanê kurdî di derheqa ayîn û stêrk-nasiyê (astronomî) de nivîsiye."

"Aryate kurdekî doxtor, zane î navdar e. 688 sal berî zayîniyê pirtûkeke mezin di derheqa hunera doxtoriyê de bi zimanê kurdî û bi alfabeke kurdî nivîsandiye."

Dûmahik heye.

- 13— *Lehman, Edward; Persisk kultur in: Orientens Forn-tidskultur, Bd.1, S.170, Stockholm 1927*
- 14— *Râsîd-i Yâsimî, Xulâm Rîzâ; Kord va Paivastagî-yi nižâdî va târixî-yi û, S.129 çâpi sêwom, Tehrân 1352 (1973)*
- 15— *Sîmyar: Ano, Zerdeşt.*
- 16— *Bedirhan, Rûşan; Şafahât min al-adab al-kurdî, S. 6-7, Beirût 1954*
- 17— *Wahby, T. and Edmons, C.J.; A Kurdish-English Dictionary, P.135, Oxford 1966*
- 18— *Steingass, F.; A Comprehensive Persian-English Dictionary, P.770, Landon 1977*
- 19— *Gulistan; Daner: Se'df Şîrâzî, Wergêr: Zekî Ahmed Henarî, Lapere 31, Bexdad-1968*

LI SER ŞAŞIYÊN HEJMARÊN BÛRÎ

HEVALÊN HÊJA:

Hejmarên Berbangê 3-4 negîhan destê min. Jimara sîsiyan xortekî raveyî min kir. Benda min a ku di bin navê ziman da hatiye belavkirin şaşiyek di çapê da xuyaye. Biraderê ku çavdarê çapkirinê ye agahî wê şasiyê ne bûye. Ez hêvî dikim hûn xwendevanên Berbangê serwextî wê şasiyê bikin, heya bizanin çawan rast bixwinin. Di rûpelê bendê

yê duduyan, sê xêzên bin sitûna pêşîn têxin bin sitûna duduyan, hînga durust tête xwendin.

Di helbesta "Agirî" da jî bêjeyaya rohilat kirine rojhilat ku ev şasiye. Rastî rohilat e, ne rojhilat. Li rohilatê Kurdistan'ê ev şasi belav bûye, bê ku kes jê hişyar bibe. Di zaravayê Kurdmancî da (ro: güneş) û (roj: gün-

dûz) in. Ji lewra rojhilat gotin şasiye. Li roavayê Kurdistan'ê ji herduyan ra jî ro dibêjin ku ew jî şaş in. Hêvîkarim ku vê rastiyanan bidin ber çavên xwendevanên xwe. Tevî gelek silavên germ û qeçîxwaziya min.

Birayê We
OSMAN SEBRÎ

TÊKILIYA

ZARAVAYAN I

Malmisanij

Fonetik (zanayîşê vengên) nawneno kî zıwanan dî gel-
leki vengi bedelîyenê. No bedelîyayîş, beyntare zıwanan
dî zî, yew zıwanî dî zarava (diyalekt)yan miyan dî zî be-
no. Bedelîyayîşê vengên ra pey, tesbit kerdîşê vengê ve-
rîni û vengê newî, asan niyo. Fîna zî kê şiyenê vajê kî
no bedelîyayîş, vatîş (telaffuz) o çetin ra ver bî vatîşo
asan o.

Zaravayane kurdîki miyan dî Zazakî û Goranî (Hewre-
mani) pêrâ hîna nîzdî yê. Zazakî, Kurmancî (Kirdasî)
û Soranî ra tîkêna dûrê yo. Cêr dî ma bedelîyayîşê vengê
nê Zazakî û Kurmancî, Soranî sero vîndenim. Têkiliya
nêvengên sero ma yew bî yew misalî dayim. * Ma vajim:

Kurmancî Zazakî

v-m : zaya.....zama

Kurmancî dî "zaya", Zazakî dî biyo "zama". Heze kî
aseno, na çesa dî tip (herf) a "y" ya Kurmancî, Zazakî dî
biya "m"

KURMANCÎ--ZAZAKÎ

A) Bedelîyayîşê tipanê dengdar (vokal) an:

1) ê - a	: hêk	hak
	hêlin	halin
2) ê - ey(ay)	: rê	ray
	pê hesin	pey hesiyayîş
3) î - e	: pîrs	pers
	tîrs	ters
4) o(û)- uwe	: sond	suwend, sond
	rûn	rûwen, ron
5) û - e	: nû, nuh	newe
	te	tû, to
6) u - î	: kuştin	kîştênî, kîştîş
	hîşk	wîşk, wîşk

B) Bedelîyayîşê tipanê bêdeng (konsonant) an:

1) b - v	: bîst	vîst
	baran	varan
2) c - g	: çan	gan
3) ç - s	: çî	se, çî
4) ç - k	: kêç	kekî
	çîya	ko(kuwe)
5) ç - t	: kûçik	kutik

6) ç - ş	: hîç	heş
7) d - b	: der-i	ber
	dîn	bin
8) d - z	: derew	zuri
	dîl	zerri, zere
9) d - v	: deng	veng
10) f - w	: heft	hewt
11) f - h	: fere(fireh)	hera
12) g - v	: gur	verg
	gotin	vatene, watîş
13) g - d	: agir	adîr
14) h - ş	: guh	gûş
15) h - w	: hîşk	wîşk
	zuha	zîwa
16) h - s	: deh	des
	bîhar	wîsar, wûsar
17) j - ş	: dijmin	dîşmen
	bejn	beşn-î
18) j - c	: jêr	cêr
	jîn	cîni, cenî
19) j - g	: dirêj	derg
20) j - s	: ajnê	asnaw
21) n - r	: nêr	rêr
22) n - l	: nîvin	lîvin
	lîng	nîngî, lîng
23) n - m	: parzûn	parzum
24) p - v	: pel-g	velg
25) r - l	: rovi	luwi, lû-y
	sal	ser-î
26) s - z	: sîmêl	zîmbêl
	pez	pes
27) v - m	: zava	zama
	mêvan	mêman
28) s - ş	: raşt	raşt
29) v - f	: zaf	zav, zof
30) v - y	: piyaz	piyanz, piyoz
	sêv	say
31) v - k	: kulilk	vîlike, vîh
32) v - w	: av	aw
	yekîrîn	wekerden,
		wekerdîş

33) ve - a	: <u>vebûn</u> <u>vekırın</u>	<u>abıyayış</u> , (<u>bıyayış a</u>) <u>akerdış</u> (<u>kerdış a</u>)
34) w - y	: <u>sêwi</u>	<u>sey</u> , <u>seyek</u>
35) x - h	: <u>xewn</u> <u>seh kırın</u>	<u>hewn</u> <u>sax kerdış</u>
36) xw - w	: <u>xweş</u> <u>xwende</u>	<u>weş</u> <u>wenda, wende</u>
37) x - g	: <u>xwin(xûn)</u>	<u>gwinı</u> , (<u>gûni</u>)
38) z - j(c)	: <u>erzan</u> <u>mêji</u>	<u>erjan</u> , <u>ercan</u> <u>mezg</u>

C) Vatan ra yew yew veng, vini beno yan zi vişi beno:

1) e - ...	: <u>-stewr</u> <u>-stêrk</u>	<u>estewrın</u> <u>estare</u>
2) d - ...	: <u>sed</u> <u>pır -</u>	<u>se-</u> <u>pırd</u>
3) h - ...	: <u>hesin</u> <u>-ewr</u>	<u>-asin</u> <u>hewr</u>
4) n - ...	: <u>ter-</u>	<u>tern</u>
5) w - ...	: <u>kotin</u>	<u>kwıtış</u>

Tay tipi zi cay xwı bedelnenê:

<u>hırmı</u>	<u>mırû</u> , <u>mırw</u>
<u>berf</u>	<u>vewr-ı</u>

Corênan ra bedelhyayışo vişi : A/2-3-6 û

B/1-25-27-28-32-35. dı beno.

SORANİ — ZAZAKİ

(Kurdiya Başûr)

A) Bedelhyayışê tipanê dengdar an:

1) ê - a	: <u>hêlke</u> <u>hêlane</u>	<u>hak</u> <u>halen</u>
2) ı - e	: <u>mırdın</u> <u>bırdın</u>	<u>merdış</u> , <u>merdenı</u> , (<u>mordene</u>) <u>berdenı</u> , <u>berdış</u>
3) o - e, uwe	: <u>xoş</u> <u>kuwe</u> <u>ron</u>	<u>weş</u> <u>ko, kuwe</u> <u>ruwen, ron</u> <u>newe</u>
4) u - e	: <u>nuwe</u>	

B) Bedelhyayışê tipanê bêdeng an:

1) ç - k	: <u>kêç</u> <u>binçine</u>	<u>kek-ı</u> <u>binke, binêke</u>
2) ç - s	: <u>çon?</u>	<u>senê, seni?</u>
3) d - z	: <u>dıro</u> <u>dıł</u>	<u>zure</u> <u>zerrı</u>
4) f - h	: <u>fênık</u>	<u>honık</u>
5) g - v	: <u>gurg</u> <u>gul</u>	<u>verg</u> <u>vil-ı</u>
6) h - y	: <u>tenha</u>	<u>tenya, tena</u>
7) j - z	: <u>jurewe</u>	<u>zere</u>
8) j - c	: <u>jor</u> <u>jêr</u>	<u>cor</u> <u>cêr</u>

9) k - h(y)	: <u>ker</u> <u>kani</u>	<u>her</u> <u>heyın(yeni)</u>
10) r - l	: <u>berg(cıl û berg)</u> <u>emsal</u>	<u>belg</u> <u>emser</u>
11) s - h	: <u>sewz</u> <u>behar</u>	<u>hewz</u> <u>wesar</u>
12) w - v	: <u>wutin</u> <u>wın</u>	<u>yatene, watiş</u> <u>vin, vind-i</u>
13) w - h	: <u>çuwar</u>	<u>çehar</u>
14) w - m	: <u>tewaw</u> <u>gaw</u>	<u>temam</u> <u>gam</u>
15) w - y	: <u>sêw</u>	<u>say</u>
16) x - g	: <u>xwên</u>	<u>gwin-ı</u>
17) xw - w	: <u>xwar-û</u> <u>xwardın</u>	<u>war</u> <u>werdenı</u> , <u>wardış</u>
18) z - s	: <u>ziw</u> <u>hez kirdın</u>	<u>sim, sêm</u> <u>hes kerdış</u>

C) Yew yew tipi vişane yan zi kemane ya:

1) d - ...	: <u>dız -</u>	<u>dızd</u>
2) h - ...	: <u>herzan</u> <u>-agadar</u>	<u>-erjan</u> <u>hagidar,</u>

3) n - ...	: <u>ter-</u> <u>piya-z</u>	<u>tern</u> <u>piyanz</u>
4) v - ...	: <u>sû-k</u>	<u>sıyık</u>
5) w - ...	: <u>êware</u>	<u>ê-re, yere</u>

D) Yew yew tipi zi cay xwı bedelnenê:

<u>nızm</u>	<u>nızm, nızm</u>
<u>nerm</u>	<u>nemr, nerm</u>

Beyntarê Zazaki û Sorani dı vêşane bedelhyayışi :

A/1 û B/ 10, 14, 17. dı benê.

* Qandê hina vişi zanayışi b'ewne :

Hadank, Karl-Mann, Oskar-Mundarten der Zaza hauptsächlich aus Siwerek und Kor, Berlin, 1932
Devrimci Demokrat Gençlik, Nr. 2-3 İstanbul

"ÇI ŞIXULÊ ME HEBÛ DI TARIXA MERIVAN DE"

M. Ferzend Baran

Rêza jorin ne ya mîn e. Ya hozanê mezin ARAGON e. Dî helbestek xwe, ku bo Pablo Neruda nivîsandîye de wusa dibêje hozan Aragon...

Dî destpêka sersala 1983' an de hozanê mezin, merivê mezin Aragon mîr. Bî gotina bapirên me, çû rehma xwedê. Weşanên hemû cihanê, dî teleksên xwe de xeberek wusa derbaz kirin lî ser mîrîna Aragon: jiyaneke 85 salî, şopek bê mîrîna berda û çû...

Belê, raste, jiyaneke 85 salî; bî zêdeyî 70 pirtûkên hêja, bî hezaran helbestên girahbaha, bî kovara Les Lettres Françaises, bî endamtiya akademiya Goncourt û bî hunermendî û bî merivati bûri çû. Lê şopek be mîrîna berda û çû. Aragon çû, dewlemendiye wi, hêjayiyên wi lî ber me ne. Fermo, em bigrin helbestên wi, ku yek jî yekî hêja, yek jî yekî xweştir e, bixwinin. Yan bigrin Le Cloches de Basel (Zingilên Basel) bixwinin. Yan Les Communistes (Komunist) bixwinin. Ev jî ne be bigrin Creve-Coeur (jana Dîl) bixwinin. Û bibinin ka meriv

zmanek çawa dikare hewqas xweş bineqşîne. Çawa dikare dilên bî jan derxîne ser ezmanan û jî wir biqirîne: merivno, meriv bin. Çawa dikare rêzek piçûk bike kozekî agir û bî milyonan dîlan pê ve bişewitîne.

Jî roja destpêka nivîsandîne heta mîrîne bî xwe re qewleki biribû (ne bî kesekî din ve, bese bî xwe re): Divê ev dîl bo merivan û serfiraziya wana lêde. Divê ev mêjî bo merivan û rîzgariya wana bixebite. Wusa digot.

Heta mîrîne ser qewlê xwe ma. Bî hezaran tişt dit. Jî hezaran gehinekan de derbaz bû. Pîr tişt guherin, pîr tişt têkçûn, pîr tişt avabûn. Lê qewlê wi qewl bû.

Jî jiyaneke hez dikir. Digot, her tişt bo jiyaneke ye. Jiyaneke hin wekhev, jiyaneke hin aza dixwest. Jî bo jiyaneke wusa şer dikir. Jî şînbûna darekî, avîsbûna kewroşkek, şivek xweş, helbestek hêja û şerê belengazan hez dikir. Digot jiyaneke ev e. Bixwinin (eger we xwendibe carek din bixwinin) ka meriv jî jiyaneke çawa hez dike.

Wi pesnê xwe ne dîda, fortan ne davêt. Çawa dîfikirî, wusa digot, wusa dînvîsand. Jî kêmaniyên xwe re digot kêmanî. (wek dî romana xwe ya yekem Anices an jî Panorama de dînvîsîne.) Rasti û hêjayiyên xwe re, digot rast û hêja ne. Meriv qedere kirdeyên xwe ne, digot.

Hozanekî, merivekî wusa mîr. Ew meriv bû. Lê merivekî wek Aragon...

Dema hevalê wi, dostê wi, hegrê wi Pablo Neruda mîr wusa dînvîsand:

*Çi şixulê me hebû di tarix
merivan de
Axx, em çima dikêşin ve
janê
Çi heye ku em lêdigerin di
dinyên wan de
Çima em ketin nav wan
wek pezeke berkêrê
Axx, me bî bawerî an jî
qiseyan
Çi guneyan (tawan) kir
ku axx.*

* * *

Pablo Neruda heval û hogirê Aragon bû. Ew jî - wek Aragon - bo çeyî û serfiraziya merivan xwe dêşand. Bo merivan dînvîsand. Hozanekî pîr mezin bû - wek hevalê xwe Aragon - welatê Neruda de bo serfiraziya meriv pêşketînek hêja hebû. Merivên wi welatê bo şîrê zarokan, nanê pîran, azadiya jînan û keda karkeran dixebitîn. Serokê wan jî yek jî wan bû. Yekî jî xwe kiribûn serokê welatê xwe.

Lê rojek reş ya îlonê, hinek merivên din, ku dijimîne merivatiyê bûn, bî çek, tanq û balafirên xwe ve hatin û gotin: meriv çî zane meriv be!

Yên nuh hatibûn, general bûn. Her tişt têkdan, hilweşandin. Bî hezaran ve meriv kuştin. Şîrê zarokan pariyanan jî destê zarokan û pîran girtin. Keda karkeran carek din bî darê zorê şelandin. Û serokê hêja yê wi welatî jî kuştin.

Û merivati dî seranserê welatê qedexekirin. Gotin; divê em birnekî, ku bapirên me lawir in. Ev pêşexistîna merivati çî ye; jî ku derketiye?

* * *

Û dilê merivê hêja, hozanê jêhati Neruda danîş nebû, teqya.

Pablo Neruda jî meriv bû. Lê merivekî wek Neruda.

Yên nuh hatibûn ser kirdayetiye jî meriv bûn. Le ew dî dî şopa bapirên xwe, angolawiran de bûn.

Gelo, lî ba me jî serê kaniyan her û her dî destê şopvanên bapiran de nebû ne?

Wek iro tê bîra min. Jî roja rojek serokê dewleta ku me Kurdan dipêçiqand de bihata bajarê me. Bajarê me, bajarêki piçûk bû, nêzî 30. hezar kes dijiya lî vir. Serokê "dewleta azîm" dê bahata. Jî 50 salî vir ve em ketibûn bîndestên wana. Her tiştê me qedexekiribûn. Dema lî ba wan, me dixwest em zmanê xwe ve bipeyivin, diqiriyên ser me: Vatandaş Türkçe konuş! Ango, hevvelatiyo turkî bipeyive! Serokê ew dewleta hov dê bihata bajarê me yê reben. Û dê navrasta (meydan) bajêr de, bipeyiviya jî.

Ez û yek jî dostên bavê min - xalê Evdo - lî çayxanê me bî lez çayên xwe vedixwar. Bo ku ev bigihên ser peyva "Serokê azîm". Ew serokê dewleta zorker bû. Diviya em biçûna. Xalê Evdo xwe xweş şîdandibû. Şelwerê xwe yê çabardîna lî xwe kiribû, xwe xweş kur kiribû û simbelên xwe boyax kiribû. Cara yekî dê serokekî bidîta. Dixwest bibîne, ka ew çî kesên hunermend in, ku dikarin 10 milyon Kurdan dardakin.

Em çûn. Ewana navrastê bî ala xwe ve neqşandibûn. Kursiyek bîlind danibûn koşeyekî navrastê da serokê serokan lî wê der bipeyive. Piştî hezar çîrîn û teçînan serok hat. Giran giran derket ser kursî. Generalekî kevn bû.

Qelafetê wi li cih bû. Xalê Evdo, hêdika, "peh... ew çî seri ye bî serok ve" got ji min re... Şaş mabû. Serê serok ji wek qelafetê wi di cih de bû. Kêmaniya serê wi tunebû. Li gor serokan bû.

Serokê me -disa giran giran-careki wisa ji jor ve li xelkê ni hêrt û -disa giran giran-kaxiza xwe ya xeberdayînê ji berika xwe derxist û sekini (serok bê kaxez nikaribû bipeyiviya) Ji me kesi tu deng dernediket. Ew deqê ku em li dû bûn, hatibû; serok dê bipeyiviya.

Serok carek—du car sivik kuxika xwe da der. Kaxiza xwe berda ser kursi (xuya bû dê çend qisa bikira, berê ku dest bî kaxiza xwe bike) û bî dengekî, ku wek ji binê birê dihat, tene tene dest bî xebirdana xwe kir:

"Sevgili Silvanlı hemşerilerim..."

Bî ev gotina serok ve, xalê Evdo ji nişka ve çiriya û got: "dê mirat, camêr hin navê bajarê me nizane !..." Xalê Evdo rast diqot, navê bajarê ne Silvan bû. Serok navê bajarê me nizanibû. Serokê

dewletek navê bajarê tê de bû nizanibû. Fêr ji nebûbû. Bawer im hewce ji neditibû. Ji ber vê yekê ji, xalê Evdo jê re "dê mirat" diqot. Serok êdi bûbû gayekî bo xalê Evdo..

Xuya ye, derdên xalê Evdo'yên me û xalê Evdo'yên welatê Pablo Neruda yek in: miratîyên, ku di serê kahniya de ne û bernadın kahni bo merivan biherikin.

Serok ji meriv bû. Lê meriveki wek mirat.

David Herbert Lawrence, wusa dest bî hilberiya(eser) xwe ya heri mezin "Evinarê Lady Chatterley" dike: "Ji ber kû sersala me sersalek bî çahr û jan e, em jê direvin, ku wê xemgin bibin."

D.H.Lawrence, romana xwe ya girahbuha piştî şerê cihanê yê yekem nivîsi. Di navbera 1925 û 28'an de li Îtalya'yê bî guhartinan 3 caran nivîsand. Di hemû jiyana xwe de tiştê heri pir dixwest bike, nivîsandina romana "Evinarê Lady Chatterley" bû. Her dixwest we romanê binivîsine.

Dixwest rewşa piştî şer di nav jiyana û danûstandinên malbatelê de nişan bide. His û dijîtiyên merivan binivîsine. Bî alîkariya tipê Sir Clifford dixwest nişan bide, ku bawerî û romanên meriveki, li gor rewşa wi ya civatî û babetê jiyana wi ye. Bî tipa Lady Chatterley ji dixwest nişan bide, ku divê meriv ji jiyana hez bike. Qurmên ku jiyana li ser ava dibe bibine, xwe bigihine wan.

Bî tipa rezwan Mellors ve ji dixwest nişan bide, ku meriv bî kêmani û hêjayiyên xwe ve heye. Meriv ji çewti û rastiyan, rindî û xirabiyan hatiye stiranîn. Tu kes bê kêmani, tu kes bê çewti tune ye, û nabe. Lê ya heri girîng, di gel kêmani û çewtiyên xwe ve, meriv bikaribe ji bo xwe û yê din jiyaneke hin çêtir ava bike, bo vê yekê bixebite.

Di dereki romanê de D.H. Lawrence, Sir Clifford û jina wi, Lady Chatterly, wusa dide peyivandinê:

"Dema giha malê, Clifford jê pirsî:

-Tu li ku bûy?

-Li daristanê! Mêzeke çiqas nêrgîzên xweş in, ne wusa? Meriv bawer nake, ku ji axê derketine.

-Lê divê meriv hawa û tava royê ji birneke!

-Lê di nav axê de avabûne, çêbûne got Lady Chatterly."

Rast e nêrgîz hewcedarê avê, hawayê û tavê ye ji. Lê eger ax tunebe, nêrgîz tu cara nikare şinbe.

Meriv bûn? ... Rast e em hemû li seranserê cihanê meriv in. Lê xwedî merivati bûyin? ...


Bawer im suala heri girîng ev e..

Dûmahika Rûpela 10'an

— Ger em kurt bîrîn ? (xulase bikin ?)

Y.G. — Beri her tiştî dixwazim bêjim ku : Divê heval bala xwe rind bîdîn wêfê diktatoriya faşist a iroyîn. Ji ber ku pîraniya hevalan, bî tiştên ku diktatoriya faşist dixwaze bike, bî tiştên ku wê bike û bî karaktera wê ya gel-dijmîni hin rind serwest nebûne. Lew re divê em kesên şoreşger û demokrat kurmên wan derînin azûyê (rastê). Em dixwazim rojekê vegerin welatê xwe. Hin dikarin vegerin lê em nikarin. Çaxa dibêjim Tirkîye dixwazim bî taybetî diyar bikim ku : ji ber ku navê wê yê resmî Tirkîye ye, loma ez ji dibêjim Tirkîye. Yan na, iro di nav tevayîya Tirkîyê de Kurdistan jî, Kurdîstaneke kolonî jî, heye. Bî ya min mirov bêje "Kurdîstana Tirkîyê" hin rastir e. Gelê Kurdîstana Tirkîyê, tenêbî hilweşandina diktatoriya faşist ve, ji bo pêşeroja xwe dikare gavekê pêşdetir bimeşe. Ji bo min, bî

ber ketina (îdrak kirin) wê yekê û têkoşina beramberî faşîzmê du tiştên jinegrîng in (xwediyê grîngahiyeke jiyane). Tiştêki din ê grîng ji ev e ku li cem hevalên Tirk, hin kurmên şovenî û pozbulîndiya li hember netewên din hene. Ez bawer im ev kurmên han, ne ji çêyiya gelan re ne. Yanî mirovên xebatkar, milliyeta wan çî dibe bala bibe, divê li hevdu xwedîti bikin. Ji ber ku pîrsa bîngehin ew e ; ku gel xwe bî destên xwe rîzgar bike. Û iro bî milyonan Lîrayên ji piştî karkerên ku li Ewropa ne têt deranin, ji çek û aletên stemkariya karbîdestanre têt xerc kirin. Ev pêstûrî (zîlm) hem li dij gelê Kurd, hem li dij gelê Tirk û hem jî li dij gelên din ên di kêmaniyê de têt ajotin... Tiştê heri grîng ê ku pêwîst e di wê xusê de bêt gotin ev e : Dîjmîne kedkarên gelê Tirk, Kurd û yê din nîvekar (mîsterek) e. Pêwîst e li hember dîjmîne nîvekar tev de tekoşîn bêt kirin.



XWEZÎ



Xwezî ji xêra xwedê ra
 Ji bavê keremê ra
 Xwezî çêbana.
 Yek carî
 Minê bixwesta bi hewarî
 Minê bixwesta
 Em du zarokên biçûk bana
 Hîn li Dinê hay nebana
 Me tim bileyîzta
 Li ser gira
 Li ber bêriya
 Li ber çema

Li bin dara
 Li ber agira
 Li pişt dîwara
 Gava min bi te ra neleytza
 Min delalfyê xwe bikira
 Gelo teyê çî bikira
 Gava min lîztikê te birevanda
 An jî pirtûkên te biqetanda
 Teyê xwe bigrîna
 An jî porê min bikîşanda
 Û
 Wê te destmala min birevanda

Xwe li pişt darê veşarta
 Minê av li te bireşanda
 Gava te bixwesta tu bazdf
 Minê solê te veşarta
 Meyê biçanda dara jîne
 Her roj avdana bi evîne
 Wê her tim dara me şîn ba
 Her tim dilê me bi evîn ba
 Lê me çî divê ji xewn û xeyala
 Ava nakin çî û mala
 Ji hev dûr dikin destê delala

DÎYA CÎWAN


EM PÊŞKETÎN DIXWAZÎN

Em keçê kurd tev li karin
 ser bilindin teyrê baz
 Şervanin em can fîda ne
 bo welat rizgarî xwaz
 Em dixwazin pêşveçûn tim
 em divên kar û xebat
 Da bikin rizgar gelê kurd
 şên bikin em ev welat
 Em keç û jin bin yata gel
 em dizînin gel timî
 Divê jîr bin em bi xebat
 rabikin derdan hemî
 Ger neçin pêş em li cîhan
 serfiraz nabe welat
 Naşikê zencîrê dilî
 gelê kurd nabe felat
 Ev hezar sale dikoşe
 kurd dirêje xwîna sor

Lê ji ber ku jin tê ne bûn
 neşikand zencîrê zor
 Lewra gelê jin di nav da
 pêşnekevin ew bi rind
 Nabin xwedî doz û hebûn
 serfiraz û serbilin
 Me keçê kurd ser bi gorî
 daniye rêka xebat
 Em dikoşin bi kil û heş
 an mirin an jî felat
 Em divê rê bûne xawer
 roja em daketine ceng
 Ma ne bes wekokê Leyla
 keça kurd a pir çeleng
 Bi xwîna Leyla dixwin sond
 em ji bona rizgarî
 Ta bilivin de bi koşin
 xwîn birêjin bi şadî

Va li dest bombe û tifeng
 em bi cangorî li ceng
 Em natirsin çet jî kuştin
 li cîhan me daye deng
 Em li xortê kurd diqîrin
 bi helanên dil şewat
 Dakevim meydana cengê
 xwîn birêjin bo welat
 Em keç û kur mil bi mil tev
 ceng bikin bona welat
 Em bi xwîna xweya paqij
 tava felat kin helat
 Deng veda dengê keçê kurd
 li zinar û latê min
 Ez bi dozêve girêdam
 bawerî xurt kir li min

ZÎNAR ŞÎRO



MUXTAR I... SERÊ MALÊ GEKEKI DIXWAZIM.
 VIRDE WIRDE NIZANIM. HUNÊ LI
 PIŞT GUND JI VEŞERIN...



WELLE QUMANDARÊ MIN, LI GUNDÊ ME GEKÊ KESI NINE.
 HUSSSSS!... HETA DEH ROJAN EZ GIL GEKI JI WE DIXWAZIM... YEK JI DIVÊ NE KÊM BE...



KÛ KÊM BE, HUN ZANIN WÊ GIL BÊ SERÊ WE...
 BELÊ..... QUMANDARÊ MIN.



PIÇÊ PIÇA, DE BAZDE JI VÊ DERÊ.
 AYYYYY.....
 sia



GUNDIN... WE JI BIHIST KÛ QUMANDAR GIL GOT. DIVÊ EM GIL GEKI PEYDE BIKIN. BIRA HERKES GÊLEK Û PEZÊN XWE BIFROŞE, PÊ GEKEKI BIKIRE.
 MUXTAR RAST DIBÊDE...



HEKÊ EM NEKIRIN Û DANENYIN PIŞT GUND; HUN ZANIN WÊ GIL BÊ SERÊ ME. WÊ ZAR Û ZÊÇÊN ME SÊWÎ BIHÊ-LIN..

WELLE RAST E. ESKERAN JI BO WÊ YEKÊ GUNDÊ QERGOYUNÊ XERAN KIR.




PANZDE ROJ ŞÜNDE
 ESKERÊN ME YÊN QERREMAN!! LI GUNDÊ MIREKA GIL GEK GIRTIN. BIST GUNDI JI JI BO ÎFADEYA WAN WERE GIRTIN, GIRTIN BIN QAVAN.

BAVÊ MIN JI BI KOTEGAN BIRIN!.....



GELO! MA LI HEMÛ WELATAN PERGAL WEHAYE?... AN Ê ME TENÊ WEHAYE?..

XACERÉZ



ÇEPERAST

- 1- Dı dirokê de dewletek, ku tê gotin bav û kalê Kurdan e, û dewleta xwe ji lı hêla Diyarbekr, Ruha û dorhêla wê daniye (2500 sal beri ledayikbûni İsa) - Rıbek, çaryek.
- 2- Belê, e. - Serekê mızgeftê, mele.
- 3- Zılm û zordesti -- Nihêrtına bı awakı tûj
- 4 Tıştek an lawrek gava nuxtı-nuxtiki be, jê re tê gotin. (berepaş).

- 5- Lawrek çip dirêj , ku mızgina hatına baharê cara yekem ew dı de.
- 6- Dema bûri ya lêkera ' badan''ê (berepaş). --hejmarek-- Wek,mina (ku tipa dawin jê kêm be)
- 7- Şiret, pend.
- 8- Feqet, belam-- Dı maneya şehid de tê bı kar anin.
- 9- Kurtenıvisa milimetreyê-- Mehek - Değbêjeki Kurd.
- 10- Cejna 21'ê Adarê-- Jı leşkerê Hitler yê n xusûsi re dıhat gotin-- Dı Kimyayê de sembola Sodyumê

SEREJÊR

- 1- Lı Kurdistanê, lı dora Diyarbekır û Mêrdinê eşirek-- Dı Kimyayê de sembola Manganez'ê
- 2- Dewletek ku parçeki Kurdistanê kırıye bı nırê xwe-- Lı alıyê Serek û Qrejdxê ji vızikê re tê gotin
- 3 Dı hundirê wi de-- Zor,çetin.
- 4- Bêjeyi-- Berê lı Mısırê ji xwe danê rojê re dıhat gotin (berepaş)
- 5- Dı Kimyayê de sembola Nikêlê --Rojek berê.
- 6- Peza mê(berepaş) -- Xwendına tıpeki (berepaş) -- Bı zarava Dımılı zava (berepaş).
- 7- Aşê dest.
- 8- Kurtenıvisa kilometreyê -- Lı alıyê Ruha'yê û dı nav Kurdên aliyê Konya'yê de dı şuna hemi, gışt, gışk de tê bı karanin.
- 9- Meriv pê avê ji vedıxwe.
- 10- Kesên zane, ghiştı, entelpektuel.
- 11- Lı hnek hereman dı şuna guh de tê gotin-- Kulêmek,kêlek.
- 12 Aletek muzikê, wek piyano ye - Dı muzikê de noteyek --Qey, gelo

M. Lewendi

NAVNIŞANA BERBANGÊ YA NU

BERBANG
Tunnelgatan. 14, 3 tr.
111 37 Stockholm
SWEDEN

TEL: 08/ 11 23 42
POSTGIRO: 64 38 80-8

BERSIVA HEJMARA 6'AN

1	X	U	N	A	V	I	D	I	L	A	N
2	E	M		E		S	O	R	A	N	
3	R	I	Ş	K		A			N	I	K
4	A	D	A	R		L	O	R	I		N
5	T		P	A	R	I		Ş			S
6		Q	I	Ş	E		K		Y	R	O
7	T		K		B		K	I	L		O
8	A	X		D	I	J		Ş	Ü	R	J
9	V		Ş	A	J	I	N		T		T
10	T		E	R		N	A	V		G	U

ŞEVA REŞ, SIYA BEDENA MIN

Şeva reş, yara min, siya bedena min, hevala gelê min. Te ez ji çelroşkî de kirim hindir dilê xu, te birînên dilê min yên bi kêm di hindir tarîbûna xu de ji ronahî veşartin, te hêstirên min kirin tev çilkên barana çelê zivistanê, ez xwedî kirim te, ez mezin kirim û ti caran ji min dūr nemayî, şeva reş.

Şeva reş, taliha li ser eniya Kurdo; ma tu çê ji min naxeyidî, tu çê dilê xu yê fere ji keserên dilê min teng nakî? Tu ji bo çî bûye aşiq bi gelê min re?

Hevde sal; şeşhezâr û dused û pêncroj, sed û çelûheşt-hezar û nehsed û bîst saet derbas bûn li ser derketina min ji welat. Şeva reş, ez ji te revîm, ji tarîbûna te, ji hevaltî û hogirya te, lê min dît ez bê te nikanim bijîm, tu bi min re mayî yar, te ez bernedam.

Wêneguhêza (televizyon) rengîn, band û pirtûk, tomo-

bîl, çirên elektrîkên; ew hemû min ji te xelas nakin. Paşkar, ez xwe di hindir zikê te de vedîşerim û vedigerim li rojên kevn, li rezan, li stirî û çaliyan, li berx û bêrivanan, li birûsk û tavan û li hêsirên dayka xwe. Dû nivê şevê xudê ji xew radibe û min ji Kurdistanê dîse vedigerîne va bajarê sar. Ew jî tenê maye û li hevalkî sêwî wek min digere. Îstiyê xwe xwar dike, digrî û gazincên xwe dike. Bibûre, dibêje xudê, "min hûn û şeva reş li hev kirin jin û mêr û nuha jî ji dest min ne der ez we û şeva tarî ji hev veqetînim û telaqa we bibirim. Ez kal bûme, ez bi faşîst û xwînmi-jan nikanim; bibûre Kurdo, min afke." Ez û xudayê kal li ser milên hev digrîn û dikevin xewa şîrin.

Bi dengê zengil re ez xwe ji şeltê çêdikim û dibînim çawa ez bi tenê mame. Yara min, şeva reş û hevalê min xudê çûne. Derim kar, li dora min

ken û kêfxweşî, şor û şabûn, ronahî. Lê çavên min henebûne şewqa royê, ew hember ronahiya wê kul dibin û hêsirên germ li ser herdû gopên min de dibarînin. Pozê min ji bayê pak dişewite û dilê min bi kewên bajêr yên qelew re nakene. Tim şeva reş tê bîra min, taliha bi tenê, qedera bi kul û keser.


Ez dixwazim vegerim. Di bêriya min de paseportek heye, ew ya mine lê ez ne ya wê me. Paseportek bê hîwa, paseportek ji armancan vala, paseportek ku nedikane min vegeerîne naw rezan, naw dumîşk û maran, jujî û kêzikan, heval û xwedîyan. Paseportek derewîn.

Şeva reş, yara min, 17 sal çûn, porê min bû gewr û sipî, çavên min bûn bi çavok, ez hatim guhertin, lê dilê min ne guherendin. Min bîra dew û mastê Kurdistanê kir, dayka min li merzel bang min dike, min bîra xuşkên xu yên ro-

nedî kir, ax û kûlika welat. Ev çî hale yarê? Hunda ez bûm wek segek bê xwedî, wek hespek lingjikestî, wek şahînek bê çanad; hunda ez bûm şeva reş û dîsa tu ji min nagerî, yara min.

Însan li ber çavên min dibin gur, xwarin û vexwarin dibin axû, ne min dikujin, ne jî sax dikin. Stiran dibin çirîn û nalîna gelê min, pêndûs di destê min de îşk dibe, şor li ser zimanê min dibin çanxil; li her çar hêlan derdikevin zurî, kevcâl, gumgumok, piler, dûmişk; ez dikevim şîne, di hêsirên de ajne dikim. Mêjî min germ dibe, ez dibêjim wek merovek dîn. Ez û gelê xu di hindir zikê te de gêj bûne. Hezar nale li te yara min, siya bedena min. Hawar ji destê te şeva reş. Min berde yarê, min berde hevala gelê min, min berde.

BÊNAV





TIKAYEK

Zor tika ye
Bo ewey minali ême's
Bûkeşûseyan dest kewê,
Wekû hemû minalani em dinyaya
Fêriyan biken
Rayan bânin
Tang û topi dagirkeran
Têk bişkênin

Foto: Ann Eriksson